

Dosiya ser Barzanî sandoqa Stalîn ya polayî da

Wezîrê Eşo

Pêşkê:

Ev dosiyaya ku em niha pêşkêşî we xwendevanên (Hawara Nû) yên birêz dikin, kurtaya lêkolîn-pirtûka dîrokzan û nivîskarê Kurd yê navdar Wezîrê Eşo ye, ya bi heman navnîşanê" Dosiya ser Barzanî sandoqa Stalîn ya polayî da". Ev demeke dirêj e ku mamê Wezîr dem û çaxa xwe terxanî vî karê xwe yê giranbuha kiriye, û bi şev û roj wê dişopîne da ku kitêb dereng nekeve, ji ber ku karê ku wî daye ber xwe karekî mezin e û bi kêmanî du sê salan wê dom bike

" Dosiya ser Barzanî sandoqa Stalîn ya polayî da", agahiyeke baş derbarê karûbarên Barzaniyê Nemir di dema mayîna wî li Yekîtiya Sovyêtiyê ya Berê, tevî rewşa jiyana û serpêhatiya Nemir û barzaniyan li wira pêşkêş dike. Her weha, ew agahiyên hêja sebarefî rewş û siyaseta wê çaxê ya cîhanê bi giştî û ya Rûsiyayê bi taybetî dide xuyanîkirin, nexasîme rol û giringiya Barzaniyê Nemir di vê çarçoviyê de bi giştî

*Wezîrê Eşo kîye ?
-Nivîskar û dîrokzan, rojnamevan û wergervanê Kurd yê bi nav û deng e .
-Sala 1934 an, li Tîblîsê-paytexta Gurcistanê, hatiye ser rûyê dinyayê .*

-Dibistana seretayî li gundê-Pampê(niha Sîpan) temam kiriye. Ya navîn jî li Tîblîsê sala 1953 an temam kiriye. Di eynî salê de, fakulteta zanîngeha Yêrîvanê ya dîrokê hatiye qebûlîkirinê, û sala 1958an ew jî temam kiriye .

-Ji 1958-61, weke rêvebirê dibistana gundê xwe Pamp ê kar kiriye .

-Ji 1961-63 li Lênîngîradê, beşa Kurdzaniyê ya Instûta Rojhilataniyê de, ber destê Kurdzanê bi nav û deng Qenatê Kurdo nava tarîxa Kurdistanê de bûye pispor .

-64-94 li Yêrîvanê-paytexta Ermenîstanê-karkiriyê weke berpirsiyarekî weşanên Ermenîstanê yên cuda-cuda, û bi taybetî weke 40 salan bi awayekî fermî û nefermî beşa weşanên Kurdî ya radyoya Yêrîvanê de karkiriyê weke rojnamevan û wergervan Weke rojnamevan nîveka salên 50-î de hetanî orta salên 90-î, bi sedan gotar û nivîsên wî rojnameya Kurdî ya Rîya Teze û hemû rojname û kovarên Ermenîstanê yên Ermenî û Rûsî de hatine weşandinê .

-Çîroka wî ya yekemîn sala 1958an bi sernavê(Beyreqa Sor) rojnameya-Riya Teze-de hatiye çapîkirinê. Piştî, çîrokên

- wî di rojname û kovarên edebî de hatine weşandinê* .
- W.Eşo 5 pirtûk-berhemên edebiyata bedew"lêkolîn û werger" li Ermenîstanê dane çapkirin* :
- Mizgînî-çîrok* .
- Dengbêj Kal Bibû-çîrok û kurte – roman* .
- Pamp-Sîpan-, kurte-romana dükûmentel* .
- Wergera du nivîsên bingehdarê kurdzaniyê li Rûsiya û Ermenîstanê yê Xaçatûr Aboviyan yên tarîxiyê-etnografîyê û lêkolîna ser wan û kar û barê Aboviyan yên Kurdzaniyê* .
- Berhevoka bi sernavê"Xebera Dosta" ku têde çîrokên 8 nivîskarên Ermenîyan hatine bicihkirinê bi wergera Wezîrê Eşo ya ser bi Kurdî.Babeta van çîrokan jiyana Kurdan û qehremanên wan e* .
- W.Eşo hatiye hilbijartinê weke endamê yekîtiya nivîskar û rojnamevanên Ermenîstanê û Yekîtiya Sovyêtiyê.Ji bona lêkolîn û wergera ser kitêba Aboviyan, ew sala 1992an hêjayî xelata bi navê Ereş Semo bûye* .
- Ji sala 1995-hetanî îro li Awropa li paytexta welatê Belçîka, Birûksilê bi cîbûye.Nava wî zamanî da, ewî zêdeyî 100 sêminar bi cîanîne, derheqa dîrok, çand û edebiyata Kurdên Yekîtiya Sovyêtiyê.Her weha, bi vê babetê zêdeyî 100 gotarên berfireh wan rojname û kovarên Kurdî da bi cîkirine, yên ku li Awropayê û welatên dinê, têne weşandinê* .
- Berhemên amade bona çapê* :
- Lêkolîna bi sernavê"Edebiyata Kurdî li Ermenîstanê". Naveroka wê derbarê tarîxa edebiyata Kurdî li Ermenîstanê ji destpêka salên 1930 tanî roja îro* .
- Du cildên çîrok û kurte-romanên wî* .
- Kitêba wî ser jiyana û karûbarê Barzaniyê Nemir li Yekîtiya Sovyêtiyê ya Berê ji salên 1947-1958, bi navê "Dosiya ser Barzanî sandoqa Stalîn ya polayî da"* .
- Lêkolîn û kitêba bi heman navî ku piştî du sê salan tê çapkirinê* .
- Bîranîn* .
- Lêkolînek li ser hunermendiya Şivan Perwer* .
- Kitêbek li ser prof.Q.Kurdo* .
- Reşnivîsên çîrok û kurte-romanên ji bona dagirtina 4-5 cildan* .
- Eger zeman hebe, ewê kitêbeke li ser dîroka Kurdên Yekîtiya Sovyêtiyê ji berê heta niha amade bike...htd* .
- B. Mistefa*
- * * *

Her çiqasî jî Melle Mistefa Barzanî û kar û barên wî yê mezin li temamiya cîhanê deng dane, navê wî yê ezîz û giranbiha hetanî ji ser zarê zarokên Kurd jî nakeve, lê hetanî niha, çiqasî jî ev yek weke paradoks, sêyir û ecêb kifş bibe, di nava xelkên cîhanê da bi giştî û di nava gelê wî yê Kurd da bi tayîbetî ew çiqasî naskiriye-heqasî jî nenaskiriye, rasttir, bi giranî bi sebebên objêktîv temamiya jiyana û karkirina wî weke pêwîste nehatine raxistinê li ber çavên civaka cîhanê û Kurdî û bi hêjatî nehatine nirxandinê. Her çiqasî jî ser jiyana Barzaniyê Nemir, ser kar û barê wî di warê rêvebirin, serkirdayîkirina Tevgera Azadîxweziya Kurd da gelek lêkolîn û bîranîn hatine nivîsandinê û weşandinê, lê zemanekî kar û barê wî yê kifş bin siyê da maye, tam û tamam nehatiye ronîkirinê, zelalkirinê û nemaze nirxandinê.Gotina min

derheqa 11 salên mayîna Nemir dane li Yekîtiya Sovyêtiyê ya Berê.

11 sal.Eva ji bona dîrokê zemanekî pir kine, lê di nava jiyana şexsekî, merivekî da ne yê kin, yê hindike.Û keder ne heqasî ewe, ku ev valayî di nava jînenîgariya Barzaniyê Nemir da çê bûye.Zû yanê dereng ew valayê bê dagirtinê.Lê keder ewe, ku vê valayê, eger em dikarin wa bêjin, tînin ser şexsê Nemir, rasttir, ser karkirina wî.Weke 11 salên mayîna wî li Sovyêta Berê ji nava kar û barê wî yê giştî derdixin, wî zemanî weke navbirî, valayî û rawestandineke nava kar û barê wî da dibînin.Lê weke emê bibînin, ev nêrîn ya çewte, ne ya rêale, bêtir ya xiyaliye, ya bê hîm û bê bingehe.Vajayî vê dîtinê ew salên berdewamkirina kar û barên Nemirin, lê gorî yê salên dinê her bi tenê bin çarşeveke reş û nava qewil û şertên xirabtir, girantir da.

Zêdeyî nivê van 11 salan Nemir bi merivên xwe va, yên ku bi wî ra çûbûn Yekîtiya Sovyêt, nava rewşeke pir giran ya sirgûnkiriyên rêjîma Stalîn da bûn, gava wê desthilatdariyê, weke Nemir bi xwe şedetiye dide, nehişt, destûr ne da, ku du barzanî bal hev, li teniştê hev bimînin.Ev rewîş ya here giran bû di nava temamiya jiyana Nemir û merivên wî da, her çiqas ya beriya wê, heqasî jî ya piştî wê da.

Bi motîvên polîtîkî rêjîma Sovyêtiyê nava van hemû salan da yên sirgûniya Nemir û merivên wî da û pişt ra jî salên rakirina rêjîma sirgûniyê ji ser wana peyvek çîye, tek-tenê peyîvek derheqa wan û jiyana wan da mediya Sovyêtiyê da nehate weşandinê:wek Nemir û merivên wî li vê cîhanê tune bûne yanê jî erd qelişîye û ew têda

çûne xwarê.Lê eger ser Nemir û merivên wî, ser rewşa wan û bi wan ra girêdayî ser pirsê Kurdî ya millî hinek tişt hatine nivîsandinê, lê ew nivîs jî bin girîf, bin dexma "Tam û temam Sirriye"da di sandoqên rêvebir û karmendên Sovyêtiyê yên polayî da hatine veşartinê.Her çiqasî Nemir ji warê sirgûniya xwe bi mecal û îmkânên cuda-cuda ji Stalîn ra name bi postê bi rê dikirin yên derheqa neheqîti û zulma, ku li wî û merivên wî hatiye kirinê, yên derheqa wê yekê da, ku wî û wana ji bin rêjîma sirgûniyê derxe, rizgar bike û weke serkirdayê Kurda pêşwaziya wî bike, lê ewî tu bersiv ji wî nedistand.Nemir bi çend sebebên aciz dibû.Yê yekemîn, ku ew name nagihîjin ber destê Stalîn.Ya duyemîn, ku dighîjin ber destê wî lê ew naxwaze bersivê bide.Ya sêyemîn, ku ew haj qedera wan, rewşa wan nîne.Û, ya çaremîn, ku ew naxwaze li qedera wan û girêdayî wê ra pirsê Kurdî va giro û mijûl be.Lê rastî, rêaltî ew bû, ku dosiyake derheqa Nemir û merivên wî da, derheqa sebebê sirgûnkirina wan û rewşa wan da, ku ji aliyê wezaretê Yekîtiya Sovyêt ya hundurî da, ku wî zemanî KGB(Komîta Aminiyeta Dewletê) jî diket nava sîstema wê, hatibû amadekirinê, Stalîn xistibû nava sandoqa xwe ya şexsî ya polayî ku tê da her bi tenê çend dokûmentên ji bona dewleta Sovyêtiyê here pêwîst, here giring dihatin parastinê, veşartinê.Û ne ku bi tenê ev.Gava berpîrsiyarên KGB rapor dan Stalîn derheqa çekirina pêwendî û girêdanan bi Mistefa Barzanî ra, hilbet, ne bê hajpêhebûn û daxwaza wî, Stalîn destûra berdewamkirina wan pêwendî û girêdanan da wan, lê bi

qewil û şertekî: bi wî awayî, bi wî şiklî, ku haya serokê Azerbeycanê Mîrcefer Bagîrov ji wê yekê tune be, ew nikaribe ser bicîanîna wê yekê haydar bibe. Ev hemûşk şedetiye dide, ku sirgûnkirina Nemir û merivên wî ji Azerbeycanê bi fesadî û nemamiya Bagîrov bi destî hinek berpirsiyarên wezaretê hundurî hatiye bi cîanînê. Weke kifş dibe, Stalîn pişt ra tecrûbe kiriye, ku di vî warî da neheqîti li Nemir û merivên wî hatiye kirinê. Bi tecrûbe min, belkî Stalîn ji nişkê va û zû nemira rewşa Nemir û merivên wî berbi qenciye, başiye biguhêrande, ew ji bin rêjîma sirgûniyê rizgar bikirana: ser bingeha raporên berpirsiyarên KGB yên rast û objêktîv, yên weke gênêralê KGB Pavêl Sûdopilatov, ku di bîranînên xwe da derheqa vê yekê da dinivîse. Ji bîranînên wî kifş dibe, ku bi ser da jî sîmpatiya wî hindava Nemir da weke polîtîkvanekî zane, kûr û dûrdîti çê bûye.

Çarçova vê gotarê, ku weke kurtaya lêkolîn-kitêba mine, ya ser kar û barê Barzaniyê Nemir li Sovyeta Berê, ku nivîsandina wê ez niha bi cî tînim, îmkane nade, ku ez bi giranî ser girêdan û pêwendiyên navbera Nemir û Bagîrov da rawestim, lê her bi tenê ezê bi kurtayî derheqa çêbûna sebebê dijminaya Bagîrov hindava Nemir da bêjim.

Gava leşkerên Sovyêtiyê zemanê şerê cihanî yê yekemîn da li hev rûniştin, hev-raqayîlbûna tevî Rojawayê û bi taybetî Amêrikayê û Îngilîtere ketin nava Bakûrê Îranê û bi taybetî Azerbeycana Îranê û Bakûrê Kurdistanê Rojhilat-Bagîrov hesiband, ku dem hatiye wê Azerbeycanê bigihîne ya xwe-komara

Azerbeycanê ya Sovyêtiyê. Û gava Barzaniyê Nemir bi merivên xwe va sala 1947a çû Azerbeycanê û beriya wê çuyîne jî bi nêrîna Bagîrov hesiya, ya derheqa wê yekê da, ku komara Kurdistanê jî ya bi navenda Mahabad dûyerojê da bixe nava sînorê Azerbeycana Îranê weke mentîqe, herêmeke avtonom, bi tundî dijî vê nêrîna serokê Azerbeycanê rawestiya. Nemir got, ku Kurd miletekî cudane û pirsê Kurdî û Kurdistanê jî cuda û serbixwe ne, nabe, ku Kurdistanê Rojhilat bibe dûçika Azerbeycanê, ku heqê Kurdan yê çêkirina komareke cuda û serbixwe heye. Ji ber vê rawestandina Nemir dijî xwe, ku ji aliyê Nemir da cesaretekî mezin bû hindava merivekî usa da, ku wek Stalînê Kavkaziyayê didîtin, Bagîrov li ber rêvebirîya Sovyêtiyê fesadiya Nemir kir, şer û şiltax avîtin wî, ku giva wî merem daniye rojekê bi çekdarên xwe va sînorê tevî Îranê biqelêşe, here Kurdistanê û li wira mîrîtîke Kurda bi seroketiya xwe li dar bixe. Belê, mîrîtîke weke yên dewra fêodaliyê, dêrêbêyîtiyê, ku Sovyêt jê aciz dibû. Çiqasî jî ev gotina Bagîrov ya ne lojîk, dûrî hiş û aqilan bû, lê di serê hinek berpirsiyarên aminiyeta Sovyêtiyê da rûnişt. Ji bona ber vê yekê bigirin bi navtêdana Bagîrovê bi hêz biriyar danîn Barzanî û çekdarên wî ji sînorê Îranê, rasttir, Kurdistanê dûrxin ber ku Azerbeycan û herdu beşên Kurdistanê yên Bakur û Rojhilatê ser sînorên hev bûn (ya Bakur bi komara Azerbeycanê ya avtonom-Nexçivanê va). Û ji bona ber vê tehlîkê bigrin biriyar danîn Barzaniyê Nemir bi merivên wî va ji cî biguhêzin komareke Asiya Navîn-

Ûzbêkîstanê, ku dûrî sînorê Kurdistanê bû. Di vî warî da Bagîrov bi ser ket, gihîşt mexseda xwe.

Heyîf, ku ji ber nestandina bersiva Stalîn ya bona namên xwe, weke me li jorê jî kifş kir, Nemir pir êşiya, aciz bû. Ew hetanî dawîya jiyana xwe jî pê nehisiya, ku haya Stalîn baş ji wî û merivên wî, ji rewşa wan hebûye, ku Stalîn bi xwe destûra çêkirina pêwendî û girêdanan tevî wî daye berpirsiyarên KGB. Hilbet, ez li vir nikarim û ne jî daxwaz dikim her bi tenê ji boyî vê helwestê Stalîn afû bikim. Îzbat ewe, ku eger Stalîn rêjîma totalîtarîyê, diktatorîyê çê nekiribûya yên weke Bagîrov jî wê nikaribûna meremê xwe bi neheqîti bi Nemir bikirana. Eger diktatorî nînbûya li ser Nemir û merivên wî rejîma sirgûniyê, yanê sûkarên polîtîkî çê nedikirin.

Ez loma aliyê zemîn da pêş ketim, min eva yeka got, ku sebebekî wê yekê raxim ber çavan, kanê çima valayîk hetanî niha çê bûye di warê ronîkirin û nirxandina jiyana û kar û barê Nemir da nava zemanê mayîna wî da li Sovyêta Berê. Her bi tenê niha hinek belge, delîl û îzbat yên ser jiyana û karê Nemir li wir eşkere dibin. Û ber vê yekê, bi ser da jî piştî wê yekê, gava sala 2002a ez cara yekemîn çûm serlêdana Herêma Kurdistanê û du cildên lêkolîna Mesûd Barzanî yên bi sernavê "Tevgera Azadîxweziya Kurd û Barzanî" ketin ber destê min, ku di wan de pir belge û îzbatên pir pêwîst jî ser jiyana û karkirina Nemir li Sovyêta Berê hatine bi cîkirinê û bi taybetî nama Nemir ya ser navê Bagîrov, min biriyar danî lêkolînekê bi cî bînim ser jiyana û kar û barê Mistefa Barzanî li Yekîtiya Sovyêt ya Berê. Di vî warî da

rewşa min weke lêkolîner ji ya pir kesan baştîre ji ber çend sebebên. Yek ji wana ewe, ku ez pisporekî dîroka Kurdistanê me. Ya duyemîn, ez pisporekî dîroka Yekîtiya Sovyêtîm û ber wê yekê jî zanê sîstêm û rêjîma Sovyêtîyê sosiyalîstîyê me. Eva yeka serkeftina mine hindava wan dîrokzanan da yên ku dervayî Yekîtiya Sovyêt hatine perwerdekirinê û jiyana xwe bi cî anîne. Her çiqasî jî ew ji min zanetir û zîrektir bin weke min lêkolîneke tam û tamam bi vê babetê nikarin bi cî bînin. Ya sêyemîn, min hinek tişt ji zarê wan merivan bihîstine, yên ku Nemir dema serlêdana wî li Ermenîstanê û bi taybetî li du gundên wê komarê yên Kurdan dîtine û guhdariya wî kirine.

Bilî kêmasiya belge, delîl û îzbatan yên ser jiyana û kar û barê Nemir li Sovyêta Berê, eynî weke dîroka Kurdistanê dîroka jiyana û karkirina Nemir jî li wî welatî bi hemdî xwe û bê hemdî xwe, gorî îrada xwe û dervayî îrada xwe, mexsûs û ji ber dîlêtantiyê, kêma zaniyê hatiye feşkirinê, falsîfikasiyakirinê û gorî van yekan jî şaş hatiye nirxandinê. Mîsaleke şaş, bi xeletî nirxandina sebebê çûyîna Nemir bi çekdarên xwe va li Yekîtiya Sovyêt ya Berê yek ji wanane. Komîsiya rêxistina navnetewî ya parastina mafên meriva li Rojhilata Navîn ya bi navê "Human Rights Watch", ku di warê sîmpatîzaniya wê ya hindava Tevgera Kurdî da şubhe nikare behe, di nava rapora xwe da dinivîse, ku komara Mahabadê her bi tenê salekê jiyana xwe berdeyam kir, "lê Barzanî bi xwe jî tevî çend hezar beşdarên serhildanê revî Yekîtiya Sovyêt". Li vira du xeletî hene. Ya yekemîn, Barzaniyê Nemir bi

500 çekdaran va çû Yekîtiya Sovyêt, lê ne bi çend hezaran va. Ya duyemîn, Nemir qet jî ne revî, lê bi hemdê xwe, û bi nêt û merem, bi armanc çû Yekîtiya Sovyêt.

* * *

Em niha bala xwe bidinê, kanê armanca çûyîna Nemir li Yekîtiya Sovyêt çi bû, ew çima ne ku bi tenê yanê jî bi çend kesan va, lê bi 500 çekdarên xwe va çû wira?. Barzaniyê Nemir weke polîtîkekî dûrdîtî nemaze piştî bi serneketina serhildana xwe ya salên 1943-1945 a li Kurdistana Başûr û çêbûna qeziya, tehlika real ji bona heyîna komara Kurdistanê bi navenda Mahabad li Kurdistana Rojhilat hate ser wê dîtina rast, ku Kurd dikarin Tevgera xwe ya Azadîxwaz, têkoşîna xwe bi sedsalan jî berdewam bikin, li çiyayên Kurdistanê yên bilind û asê neyên şikêandinê, lê bi ser nekevin ber ku bê piştgiriya ji der va û bi taybetî ya dewleteke mezin û bi hêz ew serkeftin ne mûmkûne. Û ne ji ber wê yekê, ku Kurd ne xurt, ne qehremanin, lê ji ber wê yekê, ku hêzên dijmin, yên dagîrkerên Kurdistanê yên çekdariyê bi dehan cara, em îdî nabêjin ji dehan bêtir caran jî yên Kurdan zêdetirin. Ew dewletin û sînorên wan vekirîne, dikarin her wa çekan bikin, bi dest bixin, lê Kurd nava bilokadayê, hesara çarmedorda nin û bi destxistin û anîna çekan ji bona wan pir diware. Nemir ew dewleta mezin û bi hêz jî Yekîtiya Sovyêt hesaband ji ber nêzîkbûna sînorên wê û Kurdistanê, rasttir, ji ber wê yekê, ku sînorên wan ser hevin.

Sebebekî dinê yê hîlbijartina Yekîtiya Sovyêt weke piştgira Tevgera Kurdî ya potansiyal ew bû, ku wê dewletê sîmpatiya xwe hindava çêbûna Komara Kurdistanê da eyan dikir, lê ne pir bi êşkere ji ber motîvên polîtîkî, rasttir, ji ber tîrsa xirabkirina pêwendî û girêdanên tevî cînarên xwe-Tirkîyayê û Îranê. Li vê tangê min dixwest bi sivikayî ser nêrîneke çewitya hindava pozîsiyon, tabiya Yekîtiya Sovyêt hindava komara Kurdistanê da rawestiyama. Hinek ser wê nêrîna ne rastin, ku giva bi alîkariya Yekîtiya Sovyêt yanê jî bi destî wê komara Kurdistanê hate çêkirinê, lê pişt ra Yekîtiya Sovyêt xayîntiya Kurda kir, pişt a wan vala kir, hêzên xwe yên çekdarî ji nava Komarê derxistin, birin û Kurd li ber êrîşa şahê Îranê bi tenê hiştin.

Qelet, şaşîtiya yekemîn ya vê nêrînê ewe, ku bi rastî leşkerê Sovyêtê neketin nava herêma Mahabadê, ew dûrî wê, li bakûrê wê rawestiyar gorî pevketina bi Ingilîtere û Amerîkayê ra. Leşkerê Sovyêtîyê hetanî Mahabadê nehatin, her bi tenê li bakûrê Kurdistana Rojhilat bi cî û war bûn. Bi vî awayî, piraniya erdê Kurdistana Rojhilat û di nava wê da mentîqa Mahabadê jî wek zonake bûfêriyê, wek erdekî noytiral navbera leşkerên Sovyêtîyê û Ingilîtere da ma, çê bû. Lê girêdan, çûyîn-hatina qumandarên leşkerên Sovyêtîyê bi Mahabadê ra hebû, ber ku piştî hatina wî leşkerî nava Azerbeycana Îranê û Bakûrê Kurdistana Rojhilat leşker, polis û karmendên dewleta Îranê ne ku bi tenê ji nava Bakûrê Kurdistana Rojhilat, lê her wa temamiya Kurdistana Rojhilat kişyan, derketin. A hema vê yekê jî

firsand ji bona Kurdên Kurdistanê Rojhilat çê kir, ku ewana merem û mexseda xwe ya ji zû va bicî bînin: Ser beşeke erdê Kurdistanê Rojhilat serbixwetiya xwe îlan bikin, komara xwe çêkin û ji bindestiya rêjîma Îranê ya giran rizgar bin. A bi vî awayî, ne ku Sovyêtê komara Kurdistan bi navenda Mahabadê çê kir û ew komara, weke dibêjin, hip û hazir da destê Kurdan, lê Kurdan bi xwe ew çê kirin. Şoriş, serhildana Kurdên Kurdistanê Rojhilat ji ber sebebên rewşa Kurdistanê û gelê Kurd ya hundurî çê bû, lê ne ku xelkê, li vira-Sovyêtê ji wan ra komar çê kir. Lê amadebûna leşkerên Sovyêtîyê li Bakûrê Kurdistanê Rojhilat û derketina hêzên dewleta Îranê ji nava temamiya Kurdistanê Rojhilat, weke me got, mecal, îmkân û firsand ji Kurdên wir ra çê kirin, ku ew xiyala xwe ya sal û zemanên dirêj bi cî bînin. Tam û tamam ew yek tiştêkî dine, ku gava gorî daxwaza Îngilîtere û Amêrikayê ji Yekîtiya Sovyêt, ku ew jî weke Îngilîtere leşkerên xwe ji nava axa Îranê derxe û Sovyêt jî mecbûr bû wê daxwazê bicî bîne, komara Kurdistanê ji parastina leşkerên Sovyêtîyê, çiqasî jî ew di nava sînorê wê da nîbûn, bê par, miqûf ma. Lê tehlîka here giran û rêal ji bona heyîna komara Kurdistanê wî zemanî çê bû, gava leşkerên Sovyêtîyê ji nava Azerbecyana Îranê û Bakûrê Kurdistanê Rojhilat derketin û leşkerên dewleta Îranê êrîş anîn ser van herêman û bi pê ra jî komara Kurdistanê, ku desthilatdariya rêjîma şahê Îranê ji nu va li wira bide îzbatkirinê, çêkirinê û heyfa derketina Kurdan û azeriyan ji bin desthilatdariya Îranê û ji yalê wan da

îlankirina serbixwetiya xwe ji azeriyan û Kurdan hilde, ku ew yek weke xiyaneta wan hindava dewleta Îranê da didît.

Dem, zemanê çêbûna komara Kurdistanê da Barzaniyê Nemir bi hezaran çekdarên xwe va ji Kurdistanê Başûr hatibû wir û xwe bi wan çekdarên xwe va xist xizmeta wê komarê. Ew bû qumandanê givardiya komarê, leşkerên komarê yên bijare, ku ji pêşmergeyên wî pêk dihat. Ewî roleke berbiçav list di warê qewînkirina hêza komarê ya parastinê da. Gava leşkerên Îranê êrîş anîn ser komara Kurdistanê bi meremê rakirina wê ji navê, careke dinê îzbatkirina desthilatdariya Şahê Îranê li beşeke Kurdistanê Rojhilat û cezakirina Kurdên wira serokê komarê Qazî Mehemedê qehreman, welatparêzê mezin yê gorbihuşt biriyar danî xwe ji bona gelê xwe bike qurbanî, teslimî rêjîma Îranê bike, ku bahana heyîhildana ji bineciyên komarê nehêle. Wî zanibû, ku eger ew teslimî rêjîma Îranê nebe ew rêjîmê heyîfa xwe ji bineciyên sîvîl hilde ber ku berxwedana Kurdan hindava hêzên Îranê yên çekdariyê yên mezin da ne mûmkûn bû. Her çiqasî jî Barzaniyê Nemir ev yek zanibû, lê dîsa jî dixwest xwe û pêşmergeyên xwe bi kar bîne bona parastina komarê. Lê Qazî Mehemed bi vê yekê ra qayîl nebû. Wê gavê Barzaniyê Nemir, ku îdî biriyar danî bû bi beşeke pêşmergeyên xwe va here Yekîtiya Sovyêt ji bona qazanckirina piştgiriya wê hindava Tevgera Azadîxweziya Kurd da nava dûyerojê da pêşniyar kir, ku Qazî Mehemed jî bi wî ra here Yekîtiya Sovyêt, lê ew bi sebebê, ku me li jorê

kifş kir, bi wê pêşniyarê ra qayîl nebû, lê her bi tenê Ala Kurdistanê, ku weke sembola azayî û serbixwetiya komara Kurdistanê rakiribûn ser avayê rêvebirîya wê Komarê, da destê Barzanî û jê ra got, ku her bi tenê ew dikare wê alê biparêze û careke dinê rake weke sembola azayî û serbixwetiya Kurdistanê. Û piştî vê yekê xatirê xwe ji hev xwestin.

* * *

Barzaniyê Nemir rêke dûr û dirêj, weke Mesûd Barzanî wê rê bi nav dike, ya dîrokî ji Kurdistana Başûr û Rojhilat hetanî ser sînorê Yekîtiya Sovyêt li ber kenarê çemê Aras bi çêkirina çend şerên bi leşkerê Şah ra, ku dû wî ketibûn, qedand. Sovyêt, Moskova dudilî bû li ber biriyara qebûlkirina Barzaniyê Nemir bi 500 leşkerên wî va nava sînorê welatê xwe da, lê gava ew hatin ber devê Aras rawestiyan Moskoyê rê da wan, ku ji çem derbazî nava axa komara Nexçivanê ya avtonom bibin, ku li piştî komara Ermenîstanê da bû, lê dihesibî beşeke komara Azerbeycanê. Li vir jî, Nemir weke xwe cara xemkêşiya xwe ya weke ya bav hindava çekdar-pêşmergek xwe da dîhar kir: piştî ku ew hemûşk ji çem dane derbazkirinê hêja bi xwe kete nava çem û derbazî wî berî bû, gihîşt merivên xwe. Û ji wê rojê da, weke me li jorê kifş kir, dest bi têkoşîna Barzaniyê Nemir bû nava sînorê Yekîtiya Sovyêt da ji bona qazanckirina piştgiriya wê hindava Tevgera Azadîxweziya Kurd da. Barzaniya li der û dorê axa

Kurdistana Sor ya Berê bi cî kirin, pişt ra nêzîkî paytextê Azerbeycanê-Bekuyê, hilbet, bi daxwaz û îzindana Moskoyê. Hetanî zemanekî çekên wan jî destê wan negirtin û bi ser da jî bi pisporan, bi efser-înstrûktoran alîkariya wan kirin ji bona bi cîanîna tetrîbên leşkeriyê, herbiyê. Lê piştî ku Barzaniyê Nemir dijî nêrîna Bagîrov ser Tevgera Kurdî ya Azadîxwaz, merem û mexsedên wê bi hişkî, tundî rawestiya, evê te Nemir bi merivên wî va şandin komareke Asiya Navîn ya Ûzbêkistanê û li vir hêja rêjîma sirgûnvanê tam û tamam ser wan çê kirin. Gorî wê rêjîmê du barzanî li bal hev, li teniştê hev nehiştin, her yek ji wana xistin gundekî, sênekî. Nemir jî bi tenê, bê heval û hogir gundekî şîrîketa gundiyan ya bi navê kolxoz bi cî kirin. Li wira bona berdewamkirina jiyana xwe ya aborî ew mecbûr ma weke mîzançiyê wê şîrîketê kar bike. Lê tiştê herî giran nemaze ji bona Barzaniyê Nemir nezelaliya di nava qedera wî û merivên wî da bû. Destûra wî û merivên wî nedidan, ku ji warê mayîna xwe dûrkevin, herin bal hev. Tenêbûnê û aborî, jiyana xirab morala wan pir dişkênand, ew hêvîbir dibûn. Lê ya here giran rewşa Nemir bû. Ewî xwe weke sûckar li ber merivên xwe didît weke sebebkarê xistina wan nava xerîbiyê û bin rêjîma sirgûnvana ya giran. Lê Nemir bi îrada xwe ya xurt ber xwe dida, ku bi şikestina xwe merivên xwe bêtir hêvîbir neke û neşkêne.

Piştî mirina Stalîn di sala 1953 da di nava zemanekî kifş da, hilbet, ne bi awakî ofîsiyêl û eşkere, lê dîsa jî rêjîma sirgûniyê, kontrola ser barzaniyan hate sivikkirinê, sistkirinê. Nemir

biriyar danî vê rewşê, vê firsandê bide bi karanînê ji bona bi dizî here Moskovayê û xwe û merivên xwe ji vê rewşa giran xilaz bike û belkî meremê hatina xwe ya li Yekîtiya Sovyêt jî bicî bîne. Lê çiqasî jî kontrol hatibû sivikkirinê dîsa jî nemaze ya ser Nemir dima. Ewî gotî çûyîna xwe ya li Moskovayê bi awakî usa bi cî baniya, ku kesek bi wê yekê nehisiya û ew çûyîn şerpeze nekira. Wî zemanî weke niha têrorîzm nebibû edet û ber wê yekê jî kontrola ser çûyîn-hatina rêwiyan nemaze bi teyarê hema-hema tune bû. Her bi tenê bes bû, ku bilêta te ya firîna bi teyarê hebûya. Pasporta Nemir weke sirgûnvan tune bû, lê ew ne mûşkîleke giran bû ber ku ji bona kirîna bilêta teyarê wî zemanî pasport ne dixwestin, ne pêwîst bû. Her bi tenê dima, ku Nemir bona çûyîna Moskovayê ji xwe ra cil û bergên nû bikiriyana: kostiyûm, kiravat û tiştên dinê. Ew yek jî bi cî anî: bi alîkariya merivên xwe, ku çûyîn-hatin, hevdîtina wan, nemaze ya yên li şênên nêzikî hev hêsantir bibû.

Û Nemir bi teyarê firî Moskovayê. Organên aminiyetê, rêvebiriya Sovyêtiyê wî çaxî bi hatina Barzaniyê Nemir ya li Moskovayê hisiyân, gava ew îdî nava hewşa Kirêmlê da bû: ciyê rûniştin û kakirina serok, rêvebirên Sovyêtiyê. Bê stendina îzin-destûrê ji bona wê yekê. Belê, Nemir kete nava hewşa Kirêmlê, gava teyîr bi teyîrtiya xwe nikaribû firîna xwe ser Sûra Kiremlê ya stûr û bilind ra bi cî bîne: haqasî aminiyet, parastina wê xurt bû. Barzaniyê Nemir dergehê bi navê yê Spasskiyê va kete hewşa Kirêmlê, gava ji ber tirs û xofa cezayê giran bineciyên Moskovayê û mêvanên

wî bajarî rîsk, cesaret nedikirin nêzikî wî dergehê bin jî. Em gotî ji bîr nekin, ku zemanekî dirêj fermanên bi cîanîna zor û zulma rêjîma Stalîn ji nava Kirêmlê derdiketin û ber vê yekê jî tirs û xof, sawa Kirêmlê ser merivan piştî mirina Stalîn jî mabû.

Cara yekemîn û ya dawî merivekî usa peyîda bû, ku cesaret kir vê gavê ya bi qezîya û tehlîke biavêje. Nemir ji ber wê yekê ev rîska mezin bi cesaretê xwe yê nedîtî û nebînayî kir, çimkî zanibû, ku eger bi hatina wî ya li Moskovayê bihesin wê bêfitiya wî şûn da bizivîrînin ciyê sirgûnê beriya ku ew lê bixebite, bikaribe hevdîtina bi rêvebirên Sovyêtiyê ra bi cî bîne. Lê bi cî anîna vî meremî jî pir zehemt bû, eger em nebêjin ne mûmkûn bû.

Nemir baş zanibû, ku eger teşqekekê çê neke û bi ketina wî ya bê destûrdan nava hewşa Kirêmlê dengdaneke mezin çê nebe ew nikare rêvebiriya Sovyêtiyê mecbûr bike, ku pêşwaziya wî bike.

Barzaniyê Nemir gihîşt wê yekê, ku berpirsiyarên Komîta Navendî ya Partiya Komûnîstiyê ya Yekîtiya Sovyêt û bi taybetî katibê wê komîta navendî yê yekemîn û serokê hukumeta Sovyêtiyê Nîkîta Xirûşçov pêşwaziya wî bikin. Wî ra li ber hat nêrîna rêvebiriya Sovyêtiyê ya dewrana Stalîn ya çewit, ya nêgatîv ser Tevgera Azadîxweziya Kurd red bike û ewê bide guhêrandinê û bike ya hema hema weke ya xwe û bide pejirandinê. Ewî bi taybetî Xirûşçov da bawerkirinê, ku Tevgera Kurdî ne ya feodalî û ne jî ya ajaniyêye, weke ew dexme bê sebeb û bê bingeş û hetanî warekî jî bi navtêdana Tirkiyayê û Bagîrovê Azerbeycanê wezîrê Yekîtiya

Sovyêt yê karê derva yê berê Viyaçêsilav Molotov sala 1947a danî bû ser wê tevgerê. Ew nirxandina çewit dihat wê menê, wê watayê, ku giva Kurd daxwaz dikin mîrîtîke Kurdan bi şiklê yên sedsalên navîn çêkin û di warê bi cîanîna vê sêparatîzma xwe da bûne ajanên împêriyalîstên Rojavayê, weke rêvebiriya Sovyêtiyê dewletên Rojavayê yên mezin bi nav dikirin, û bi destî Kurdan ew împêriyalîst dixwazin zirarê bidin Yekîtiya Sovyêt.

Absûrdeke temam, lê rêjîma Stalîn baweriya xwe bi vî ser û şiltaxê eşkere jî danî. Nemir kifş kir, ku Kurdên Kurdsitana Başûr (Îraqê), her wa rêvebiriya Tevergera Azadîxweziya Kurd bi serokatiya wî mêtodên nû, dêmokiratik bi cî tînin bi damezirandina Partiya Dêmokirata Kurdistanê hê di sala 1946 da û daxwaz dikin ji bindestiya rêjîma Îraqê ya paşverû, nijadperestiyê rizgar bibin. Wî her wa kifş kir, ku Îngilîtere piştgiyariya rêjîma Îraqê dike ber ku wî welatî weke koloniyake xwe dibîne û ber wê yekê jî eşkere alîkariya wê dike dijî Tevergera Kurdî. û ne ku bi tenê piştgiyariya wê rêjîmê bi çekan dike, lê bi xwe jî nemaza bi aviyasiya, bi teyarên xwe yên herbê beşdarî pelçiqandina serhildana Kurdî bû ya salên 1943-1945a. Me şer dirêkt bi Îngilîtera ra danî, wek dewleteke împêriyalîsitiyê, lê çawa dibe em bi pê ra jî bibin ajanên împêriyalîstên Rojavayê?"-Barzanî rêvebirên Sovyêtiyê ra got.

Barzaniyê Nemir rêvebiriya Sovyêtiyê da famkirinê, ku ew û partiya Dêmokirata Kurdsitanê qet jî ne komûnîs û ya Komûnîstiyê ne, lê eger Yekîtiya Sovyêt wek gelên Rohilatê yên dinê piştgiyariya gelê Kurd, Tevergera

Kurdî jî bike-Kurd amadene hertim bi helalî û aminî xwe bi wê bigirin, xwe minetkarê wê bihesibînin. Evê rastgotinî û helaliya Barzaniyê Nemir îtbara rêvebiriya Sovyêtiyê ya bêtir hindava wî û Tevergera Azadîxweziya Kurd da ya bi serokatiya wî qazanc kir û bi ser da jî sîmpatiya Xirûşçov hindava şexsê wî û Tevergera Kurdî da çêkir.

Li vê tangê ez pêwîst dibînim bêjim, ku Xirûşçov bi nav dikirin wek polîtîkvanê voliyûntarîst. Eva dihat wê menê, wê watayê, ku ewî polîtîka xwe bi hest û hisan jî dimeşand. Bilî motîvên xwerû polîtîkî, bilî li ber çavên xwe girtina menfeeta dewleta Sovyêtiyê ewî gorî vî karaktêrê xwe jî hetanî dawîya seroketîkirin, rêvebiriya wê dewletê di sala 1964 an da eşkere û bêminet piştgiyariya têkoşîna Kurdî li Kurdistana Başûr bi seroketiya Barzaniyê Nemir kir bi binpêkirina hinek motîvên polîtîkî, rasttir, bi rind zanîna wê yekê, ku ev yek qet jî li Tirkiya û Îranên cîran xweş nayê, bi ser da jî wan pir aciz dike. Gava sala 1963a serhildana Kurdan li Kurdistana Başûr ji nû va gurr û geş bû û rêjîma Îraqê êrîş bir ser Kurdan-hukûmeta Sovyêtiyê destûr da Kurdên welatê xwe, ku ewana eşkere piştgiyariya têkoşîna birayên xwe bikin bi medyayê û bi taybetî bi weşanên bi zimanê Kurdî yên li Radyoya Ermenîstanê ya li Yêrîvanê. We bidîta, weke dibêjin, çawa agir-alav ji ber ronakbîrên Kurd yên bi nav û deng, ji ber xwendekarên zanîngehên Yêrîvanê yên Kurd diçû, gava destûr didan wan bi radyoyê bipeyîvin û piştgiyariya serhildana birên xwe li Kurdistana Başûr bikin. Cara yekemîn nava dîroka Kurdan Yekîtiya

Sovyet da firsandekê wa ji wan ra çê dibû û ewane weke pêwîste dilê xwe rehet dikirin.

Piştî Xirûşçov seroketî, rêvebiriya Sovyêtiyê hêdî hêdî hindava Tevergera Kurdî ya Azadîxwez da sar bû, hêdî-hêdî berê xwe ji wê Tevergerê guhêrand, lê îdî nîveka salên 70î, gava Seddam Huseyîn, ku wî zamanî hê cîgirê serokê Îraqê bû, eniya netewî li Îraqê çê kir bi beşdarbûna Partiyayên Baas û Komûnîstiyê. Gava rêjîma Îraqê pêşniyar kir, ku Barzaniyê Nemir jî bi Partiya Dêmkirata Kurdistanê bikeve nava wê eniyê, û sozê avtonomiyêyê berfirehtir da wî, lê Nemir weke şert xistina Kerkûkê nava sînorê wê avtonomiyê da ber wê rêjîmê. Lê rêjîm ne amade bû vê gavê biavêje, Kerkûkê destê Kurdan va berde. Wê gavê Saddam hawara xwe xist ber rêvebiriya Sovyêtiyê, ku ew Barzaniyê Nemir mecbûr bike, ku bê çareserbûna pirsê Kerkûkê bikeve nava eniyê.

Saddam ji boyî vê yekê serlêdanên xwe li Moskovayê bi cî anîn. Bi xistina Komûnîstan nava eniyê Saddam îtbar û mêtîngirtina rêvebiriya Sovyêtiyê hindava xwe da qazanc kir û ber vê yekê jî Sovyêt ser Nemir rawestiya û jê daxwaz kir, ku bikeve nava eniyê. Lê Nemir ne ji wan serkirda bû, ku dest ji pirînsîpên xwe bikişîne û peymanê derheqê avtonomiya Kurdistanê da bê Kerkûk îmze bike. Bi vê helwesta xwe Nemir berê Sovyêta ji Tevergera Kurdî da guhêrandinê, hetanî warekî ew ji dosta xwe kir dijmin, lê çareserkirina pirsê Kerkûkê dûtahiyên xwe yê îroyîn ra hişt.

Sovyetê ne ku bi tenê girêdanên xwe bi Nemir û Tevergera Kurdî ra birîn, qut kirin, lê bi ser da jî vejîna nêrîna

rêjîma Sovyêtiyê ya dewrana Stalîn hindava Tevergera Kurdî da çêkir bi navkirina wê weke ya fêodalî, paşverûtî.

* * *

Me dixwast vê tangê bi giranî ser şîrovekirina helwest, dîtina Partiya Yekîtiya Sovyêt ya Komûnîstiyê û ya Partiyayên welatên dagîrkerên Kurdistanê yê Komûnîstiyê hindava Tevergera Kurdî da ya li van welatan rawestiyana, ku, alîkî da, çewitiya helwest, dîtina wan, lê aliyê dinê da ya Barzaniyê Nemir ya rast hindava wê nêrînê û Tevergera Kurdî ya Azadîxwez da zelaltir bihata raxistinê li ber çavan. Me her wa dixwest girêdayî vê yekê ra feşkirin, falsîfikasiyakirina helwesta Nemir û kar û barê wî bi Yekîtiya Sovyêt ya Berê red bikra wek ya bê bîngêh, bi ser û şiltax. Beriya hemûşkî pêwîste kifş bikin, ku îdeolojiya van Partiyayên Komûnîstiyê hindava Tevergera Kurdî ya Azadîxweziyê da ne ku ji înterês, berjewendiyên wê Tevergerê dihat, gorî armanc, meremên wê Tevergerê hatibû levdanînê, lê gorî polîtîkayê û bi taybetî polîtîka dewleta Sovyêtiyê hindava welatên dagîrkerên Kurdistanê da. Û ber ku partiya komûnîstiyê li Yekîtiya Sovyêt ya rêvebir bû, ya meşandina polîtîka dewletê bû, ber wê yekê jî ewê ne ku gorî îdeolojiya marksîzm-lênînzîmê ya giştî, lê gorî polîtîka wê dewletê îdolojiya, bîr û bawereke xisûsî ji bona Tevergera Kurdî ya Azadîxwez sêwirandibû, li hev danî bû. Û dîsa, ber ku dewleta Sovyêtiyê û bi wê ra tevayî partiya wê dewletê ya komûnîstiyê

polîtîka dostaniyê, cînartiya qenc û hevkarîyê hindava welatên dagîrkerên Kurdistanê da dimeşandin, polîtîka wê dewletê û partiya wê ya rêvebir ya dijî berjewendiyên Tevgera Kurdî ya Azadîxwaz bû, çimkî ew Tevger bi xwe dijî desthilatdariya dewletên dagîrker bû ya ser Kurdistanê. Eger dewleta Sovyêtiyê û Partiya wê ya komûnîstiyê piştgiriya Tevgera Kurdî ya Azadîxwaz bikira weke tevgerên gelên dinê yê Azadîxwaz ewê bê hemdî xwe dijî polîtîka xwe ya dostaniyê, hevkarîyê û cînartiya qenc bi dewletên dagîrkerên Kurdistanê ra derketa. Lê eva yeka ne menfeeta dewleta sovêtiyê da bû, ya ku bi tenê dewletên Rojavayê yên mezin û bi hêz, weke wê ewana bi nav dikirin, yên împerialîstiyê weke dijminên xwe didîtin, lê dewletên cînar ji bona parastina sosiyalîzima xwe li ber wan dewletên mezin ji xwe ra kiribûn dost û gelê Kurd, Tevgera wî ya Azadîxweziyê jî dikirin qurbanîyên wê polîtîka xwe. Lê ji bona eşkere dijî Tevgera Kurdî ya Azadîxwaz dernekeve û bi wê yekê xwe di çavê civaka navnetewî da reş neke, dewleta Sovyêtiyê û partiya wê ya komûnîstiyê bi awakî perdekirî ew polîtîka xwe ya bi rastî ya dijminatîyê hindava gelê Kurd û Tevgera wî da dimeşand. Ev polîtîka xapandina Kurdan bû, ya danîna serê wan ser balgiyê nerm. Belê, dewleta Sovyêtiyê û partiya wê ya komûnîstiyê ev polîtîka xwe hindava dewletên dagîrkerên Kurdistanê da, ku cînarê wê dewletê bûn û eynî zemanî da hindava Tevgera Kurdî da gorî vê pirînsîpê dimeşand: "Ne şîş bişewite û ne jî kibab". Lê bi rastî Kurd û Tevgera wan dişewitîn. Ber vê yekê û ji ber nîşandana helwesta Nemir ya rast

hindava Tevgera miletê xwe ya Azadîxwaz da û, dawiyê, ji bona redkirina falsîfikasiyakirina wê helwesta Nemir ezê piştî vê pêşgotina bi giştî ser vê pirsgirêkê konkrêttir rawestim.

Gorî bîr û bawerên îdeolojîyên Partiya Komûnîstîyên Sovyêtiyê û bi şîretkirina wan yên yekdestên wan yên ji Partiyayên welatên dagîrkerên Kurdistanê yên Komûnîstiyê Kurd gotî bendê bimana hetanî wan welatan da bi destî wan partiyayên komûnîstiyê "dêmkirasî" bihata çêkirinê, rasttir, sazûman, desthilatdariya Sovyêtiyê sosiyalîstiyê û di nava çarçova wê "dêmkirasîyê" da, di tixûbên wan welatan da Kurd hêja bigîştana heqê xwe, destdanîna mafên xwe yên millî, ber vê yekê jî, gorî vê bîr û bawerîya komûnîstiyê heqê Kurda yê cudaxweziyê, veqetandina xwe û welatê xwe yê eslî-Kurdistanê ji welatê dagîrker tune bû, ev yek weke sêparatîzm bi nav dikirin, lê sêparatîzm jî wek tiştêkî paşverû, tiştêkî pir xirab, wek nijadperestî, hetanî fasîştî û paşverûtî jî dinirxandin. Gorî wê îdeolojiyê heqê welatên dagîrkerên Kurdistanê, milletên wan yên rêvebir hebû, ku dewleta wan ya serbixwe hebe, lê heqê Kurdan yê vê yekê tune bû. Lê Kurdan gorî vê bîr û bawerîyê çi bikira? Kurd gotî biketana nava Partiyayên wan welata yên Komûnîstiyê, ewana xurt bikrana, bibûna xizmetkarên wan her bi tenê ji bona çêkirina dêmkirasîyayê di wan welatan da. Bi vî awayî çepên Kurda peyîda bûn, yên ku bi piraniya xwe va welatparêz bûn, lê bi rastî, bê ku haya wan ji wê yekê hebe, bê ku netîca kar û barê xwe ya

eynî bihesin, mala gelê xwe xirab dikirin, û xwe jî dikirin qurbanîyê bîr û bawerên Komûnîstiyê. Ewana bûn lînîvan, Stalîvan, tiroskîst, maoçî û nizamî îdî çî, lê her bi tenê nebûn Kurd. Barzaniyê Nemir wek polîtîkê dûrebîn û kûr, wek xudanê tecruba mezin nikaribû ev îdeolojî, ev bîr û bawer qebûl bikra, bipejiranda û ez bi bawerîya tam û temam dikarim bêjim, ku ew jî lîderên Kurdan yê zemanê herî nû yê yekemîn bû, ku dijî vê dîtîne, vê îdeolojîyê rawestîya. Û bi mêranî dîtîna xwe li Yekîtiya Sovyêtiyê jî parast. Ewî ne ku bi tenê dîtîna Komûnîstan qebûl nekir, lê bi ser da jî ya xwe ya hindava bi cîanîna Tevgera Kurdî ya Azadîxwaz da bi rêvebir-Komûnîstên Sovyêtiyê da qebûl kirinê, ser wan da ferzkirinê. Evê yekê em dikarin bi nav bikin weke Fênomêna Barzanî, ber ku bilî wî tu kesî cesaret nedikir Navenda îdeolojîya Komûnîstiyê-Moskovayê da nêrîna xwe ya jî helwesta komûnîstan cuda bida qebûl kirinê. Eva yeka beriya hemûşkî wê dîtîna û gotîna Rojavayê red dike, ku Barzanî "Gênêralê Sor" bû, yanê: yê Komûnîst. Ya pir mûhîm, giring ewe, ku Barzaniyê Nemir ne ku bi tenê hev dîtînen girtî da yê bi rêvebirên Sovyêtiyê ra, lê li derên din jî, gava pêwîstî çê dibû, bi eşkeretî ser dîtîna xwe dima û mineta xwe ji tu kesî nedigirt.

Awa, mîsaleke wê yekê:

Gava Nemir sala 1956a ji Moskovayê hate Ermenîstanê-serlêdana Kurdên wira, di civîn-hevdîtîna bi gire girên Kurdên Ermenîstanê ra, çî yê karmendên hukumeta wê komara Sovyêtiyê û çî jî ronakbîrên Kurda yê bi nav û deng ra li rêdaksiyona

rojnama Kurdî ya Riya Teze li Yêrîvanê, karmendekî hukumeta Ermenîstanê yê bilind -cîgirê wezîrê avtotransportê yê yekemîn, dîrokzan û nivîskarê Kurd Nadoyê Xudo Maxmûdov, hindava welatparêziya kîjanî da tu şubhe tune bû, ji Nemir ra got:

-Riya rizgarbûna gelê Kurd nava marksîm-lînînzîzmê ra, îdeolojîya Komûnîstiyê ra derbaz dibe.

Ser vê gotîne Nemir eşkere aciz dibe, weke xwe caran diranên xwe yê jor û jêr bi hev va diguvêşe û dibêje:

-Nado, Nado, em marksîzm-lînînzîzmê jî zanin, îdeolojîya Komûnîstiyê jî zanin û rê û dirbên bi destanîna heqê miletê Kurd yê rasttir jî zanin. Nemir ne ji wan merivên basî û xêfikê dilê xwe bû, ku nizanibûya, ku di nava merivên, ku bi wî ra seferê dikin bêfîtiya ajanê KGB heye û li wir jî amadeye. Lê ewî minet ji wê yekê negirt, ku ew ajanê vê gotîna wî bighîne jorê, çiyê pêwîst û dîtîna xwe eşkere kir. Her bi tenê Nemir dikaribû rastiya xwe bi vî awayî biparêze. Van dawîya di nav Kurdan da "ronakbîrekî" paranoyak, eşkere nexweşê pisîkolojî peyda bû, navê kîjanî ez naxwazim li vir bêjim, ku bi wê yekê vê nivîsa xwe neherîmînim, û got, ku Barzaniyê Nemir ajanê KGB-a Sovyêtiyê bûye. Ne ku ew yek bi min pir keder tê, ku yê wî awayî di nav me Kurdan da peyîda dibin, lê ew yek, ku çend kesan ji me hetanî warekî ew temûl kirin û çend kesan jî piştgiriya wê kirin. Bi derengî, lê dîsa jî ez dixwazim li vir bersiva wî paranoyakî û çend piştgirên wî bidim. Ez ne ku ji ber wê yekê bi tenê ser van kesan disekinim, ku ew siyê davêjin ser navê

serkirdayê gelê Kurd, ku îro navê wî bi heqî bûye pîrozîke temamiya gelê me, lê ber wê yekê, ku ev gotina han eşkere û bi temamî şer û şiltaxe, weke gelê me dibêje, kirasê bê pêsîre, ya ji ber xwe derxistî, bê bingeh, ku şubha desttêwerdana dijminên gelê Kurd jî û wê nêrînê jî bal min çêdike, ku belkî ew "ronakbîr" ajanê wan dijminane. Ezê li vê tangê dîtina xwe derheqa Barzaniyê Nemir da ser bingeha delîl-îzbatan eşkere bikim.

Gênêralekî KGB ya Sovyêtiyê, ku di nava rêvebirîya wî dezgehê aminiyetê da hema hema karmendê duyemîn bû piştî serokê wê Lavrêntî Beriya, ku endamê Polîtbûroya komîta Navendî ya Partiya Komûnîstên Sovyêtiyê bû, Pavêl Sûdopilatov kitêba bîranînên xwe da derheqa rasthatinê xwe yên bi Barzaniyê Nemir ra dinivîse û wî weke polîtîkekî pir zane û têgihîştî dinirxîne. Hilbet, vî Sûdopilatovî xwe ber Nemir eyan dikir wek karmendekî komîtêya Navendî ya Partiya Komûnîstiyê û bi femîleke dinê, ku wî aciz neke. Ew di bîranînên xwe da derheqa bûyerekê da dinivîse, ku girêdaye şexsê Nemir ra. Gêneral kifş dike, ku barzaniya bi seroketiya Mistefa Barzanî hewil didan xwe, ku sura wan dernekeve der va û nemaze ber guhê KGB nekeve. Sûdopilatov dinivîse, ku KGB merivek ji nava barzaniyan kiribû ajanê xwe. Piştî zemanekî ew meriv bê ser û berete unda bû. Piştî wê gêneral kifş dike, ku ihtîmal barzaniya bi ajaniya wî hesiyane û bi emrê Mistefa Barzanî ew serunda kirine. Belê, li welatê Sovyêtiyê jî dezgehê aminiyeta Mistefa Barzanî kar dikir, ku rê li ber dervaçûna sura barzaniyan bigire. Her bi tenê ev

bûyer, ev îzbat bi temamî wê gotinê red dike, derew derdixe, ku giva Barzaniyê Nemir ajanê KGB bûye yanê bi xwe ajaniya xwe kiriye. Barzaniyê Nemir nebû ajanê KGB, bi ser da jî ajanekî wê yê ji merivên xwe serunda kir, lê dîsa jî sîmpatiya berpirsiyarekî KGB-Sûdopilatov hindava xwe û Tevgera Kurdî da qazanc kir û ew kir piştgirekî wê tevgerê. Gava piştî mirina Stalîn û gullekirina hogirê wî yê nêzik Bêriya Xirûşçov hat ser zîn, bû serokê dewleta Sovyêtiyê-hemû berpirsiyarên KGB weke merivên bêitbar hindava desthilatdariya xwe da girtin û avêtin hebsxanê û di nava wan de gêneral Sûdopilatov. Weke dîsa Sûdopilatov bîranînên xwe da şedetiyê dide, ewî ji hebsxana xisûsî ya bajarê Biladîmîrê hukumeta Sovyêtiyê ra name nivîsiye û bi rê kiriye û di wê da kifş kiriye, ku di menfeeta Yekîtiya Sovyêtiyê dane piştgiriya Tevgera Azadîxweziya Kurd bi seroketiya Mistefa Barzanî bikin. Piştî vê agahdariyê Sûdopilatov dinivîse, ku ew pir şa bûye, gava pê hisiyaye, ku hukumetê ev pêşniyara wî pejirandiye, begem kiriye û ewê bicî tîne.

Belê, Nemir dost û piştovanên gelê Kurd û Tevgera Kurdî hetanî di nav KGB da jî qazanc dikirin ber ku, weke dibêjin, şûrê xwe rast girê dabû û bi rastî û helaliya xwe îtbar û bawerî hindava Tevgera gelê xwe da çê dikir. Ez derheqa vî hemûşkî da di lêkolîna xwe da bi hûrgilî, lê vê nivîsa xwe da bi sivikayî dinivîsim, ku haya gelê me baştir û temamtir ji kar û barê Nemir li Sovyêta Berê hebe û ew bizanibe, kanê lawê wê yê şîrhelal çî kirên mezin û qenc ji bona wî gelê xwe bi cî anîne

di nava qewil û şertên giran da. Û ne ku bi tenê yên weke Sûdopilatov, lê dewleta Sovyêtiyê bi giştî ji dijmin, neyara Tevgera Kurdî kir piştgira wê, nêrîna rêvebiriya Sovyêtiyê ya pir salan, ya ku bibû ya dogamtîk, şikênand, da guhêrandinê: ji ya dîtina ser Tevgera Kurdî wek ya fêodaliyê û ajaniyê kir ya weke ya Azadîxwez. Û çiqasî jî ev nêrîn pişt ra bû ya nêgatîv, lê ewê zemanekî kifş da rola xwe ya qenc list di warê kamilbûna Tevgera Kurdî da û nemaze wê yekê da, ku Pirsra Kurdî bêtir bû ya navnetewî.

* * *

Piştî, ku rêvebiriya Sovyêtiyê Barzaniyê Nemir weke serkirdayê Kurdan nas kir û helwesta wî jî ya ser awayê bi cîanîna Tevgera Kurdî ya Azadîxwez pejirand-destûr da wî, ku ew li Moskovayê bimîne. Li payîtextê Yekîtiya Sovyêt ode dan Nemir û bi daxwaza wî ew Akadêmiya zanînên herbê da ji bona perwerdebûnê, temamkirin û tamkirina zanînên xwe di warê hunermendiya herbê da qebûl kir.

Lê daxwazeke Nemir ya ji bona wî ya here giring û aktûel ew bû, ku rêvebiriya Sovyêtiyê rewşa merivên wî li Ûsbêkîstanê xweş bike û ne ku bi tenê ya aborî, sosiyaliyê. Nemir ji wê rêvebiriyê daxwaz kir, ku ji bona merivên wî qewil û şert, îmkanên qenc û berfireh çê bikin, ku ew bikaribin xwe di warê zanîn, pêşê cuda-cuda da bidin perwerdekirinê. Lê eger ji barzaniyan kêr meriva xwe bi perwerdekirinê girtin ew ne sûcê Nemir û ne jî yê rêvebiriya Sovyêtiyê bû, lê yê temenê mezin û wê yekê bû,

ku hinek ji barzaniyan hema hema nexwendî bûn. Bilî vê, Nemir ji Moskovayê girêdan û pêwendiyên berdewamî, direkt bi merivên xwe ra li Ûzbêkîstanê çê kirin ber ku weke ewî nama xwe da ya ser navê serokê Azerbeycanê Bagîrov kifş kiribû, ewî merivên xwe weke ronaya çavên xwe didît. Lê Nemir jî ne ji wan merivan bû, ku eger ne ji dil bûya, ev peyv bidana ber bê.

Piştî cîwarbûna li Moskovayê Nemir hêja ji îzolebûn, qutbûna xwe ya ji cihanê û nemaze ji gel û welatê xwe derket. Û ewî hewil da xwe, ku hemû mecal û îmkanên, ku ji destê wî tî, bi kar bîne ji bona çêkirina têkilî û girêdanan bi Kurdan ra, çawa yên bineciyên Yekîtiya Sovyêtiyê usa jî nemaze bi wan ra yên ku ji Kurdistanê yanê jî welatên Awropayê û yên Asiyayê tî Moskovayê ber ku destûra wî nedidan, ku ew bi xwe here welatên derva ji ber motîvên polîtîkî. Bona Nemir weke serkirda her gotinek, her peyvek ser rewşa gel û welatê wî pir pêwîst bû ber ku çend sala qet haya wî ji wana tune bû. Ji ber wê yekê pêwîst bû, ku ew xwe bikaribe hemû aliya da amade bike bona bûyerên dûyerojê ku dikarin li welatê wî çêbin û ew jî bikaribe li ser rewşa welêt û gel hayîdarbûyî beşdarî nava wan bibe. Ewî baş zanibû, ku, weke dibêjin, îro na-sibê sîtûasiya, rewşê bê guhêrandinê û riya wî ya berbi Kurdistanê wê vebe. Ew bêsebir benda vebûna vê rê bû ber ku rêke dinê ji bona wî tune bû.

Dema nirxandina Nemir weke eynî polîtîk û serkirdayê gel em gotî vî karaktêrê wî, vî awayê bi cîanîna polîtîka wî dora çareserkirina pirsra

Kurdî bigirin ber çavan:ewî her bi tenê ser bingeha haydarbûn, komponêntbûna xwe ya tam û tamam ya ser rewşa welêt û gelê xwe û gorî wê rewşê wek polîtîkvan, wek serkirda kar û barê xwe nava jiyane, bi piraktîkî bi cî danî.Ji pir mîsalên îzbatkirina vî karakterê wî, mantalîta wî em her bi tenê yekê li vira bînin navê.Gava Nemir nû ji xerîbiya 11 salan vegehiya bû Bexdayê-çend polîtîkvan û ronakbîrên Kurd çûn wir dîtina wî.Û gava gotin hat ser rewşa Kurdistanê û gelê Kurd ya hemdem û ewên çûbûn serlêdana Nemir li ber hesêb girtina wê yekê, ku Nemir pir salan ji welat û gelê xwe qut bûbû, ew ser çend tiştên rewşa Kurdistanê û gelê Kurd agahdar kirin.Nemir cî bi cî, dest xwe da kêmasî û şaşîtiyên wan di wî warî da eyan kirin û ew şaş û metelê wê yekê hiştin, ku bi çi awayî haya wî ji ya wan baştir ji wê rewşê heye.

* * *

Eger Barzaniyê Nemir ji ber sebebên femdarî nikaribû biçûya welatên dervayî Yekîtiya Sovyêtiyê û nemaze Kurdistanê, lê destûra wî hebû nava goveka Yekîtiya Sovyêtiyê da bigeriya, sefer bikra, lê her bi tenê dîsa bi motîvên polîtîkî nava bêdengiyê da. Ev jî bona wî bes bû.Û Nemir hewil da xwe vê nîvazadiya xwe bi kar bîne ji bona naskirina Kurdên Yekîtiya Sovyêtiyê û rewşa wan.Lê gorî pevketin, hev rûniştina bi berpirsiyarên hukumeta Sovyêtiyê ra ew vê gavê dikaribû biçûya bi tenê nava olkeke Kurdên Sovyêtiyê, komareke wî welatî ber ku hukumet ji dengdan, eşkerebûna serlêdanên wî yên pir ditirsiya.Wê hukumetê, çiqasî

jî haya welatên dervayî Yekîtiya Sovyêtiyê û bi taybetî yên Rojavayê yên mezin baş ji wê yekê hebû, ku Barzaniyê Nemir bi merivên xwe va ji sala 1947an da li Yekîtiya Sovyêt bi cî bûye, lê dîsa jî ewe nedixwest, ku derheqa wê yekê da îzbat bikevin destê wan û ew wan îzbatan dijî înterês, dijî berjewendiyên wê bi kar bînin, bêjin:"Bala xwe bidinê, Sovyête Barzanî bal xwe bi cî kiriye, ku ewî ji bona înterêsên xwe û dijî yê dewletên dinê û nemaze yên dagîrkerên Kurdistanê bikar bîne"Hetanî gava Nemir piştî şorişa 14ê tîrmehê sala 1958a vegehiya îraqê jî Sovyête ew îzbat bi motîvên polîtîkî neda destê Rojavayê û dewletên dagîrkerên Kurdistanê:ew ser Çêxosilovakiyayê, paytextê wê-Piragayê ra birêkin Qahîrê û ew ji wir hêja çû Bexdayê.

Ber van motîvên polîtîkî rêvebiriya Sovyêtiyê Nemir ra got, ku destûra çûyîna her bitenê nava olkeke Kurdên Yekîtiya Sovyêtiyê, Kurdên her bi tenê komareke welat dide wî û ew komar jî ya Ermenîstanê ye.Ev pêşniyar dihat menfeeta dewleta Sovyêtiyê ber ku hilperîna çanda Kurdî ji hemû komarên, ku Kurd lê diman, bêtir li komara Ermenîstanê çê dibû, ku bibû navendeke çanda Kurdî ya here mezin û dînamîk.Hukumeta Sovyêtiyê dixwest, ku bi nîşandana rewşa Kurdên Ermenîstanê nemaze di warê pêşvaçûna edebiyet û çanda wan da dilê Nemir xweş bike, ku ber wî eyan bike, kanê dewleta Sovyêtiyê, sazûmana sosiyalîstiyê îmkanên çiqas mezin di wî warî da daye çend deh hezar Kurdên Ermenîstanê, yanê jiyana Kurdên wir, rewşa wan bike wek vîtrîn, mîsala pêşveçûna hemû

Kurdên Sovyêtiyê. Belê, Sovyêt di warê çêkirina vûtrînan da li ber çavên biyaniyan, xerîban hosta bû. Wî zemanê bicîhatina serlêdana Barzaniyê Nemir nava Kurdên Ermenîstanê li paytextê wê komarê-Yêrîvanê ji nû va rojnama Kurdî ya Riya Teze piştî rawestandina weşandina wê di sala 1937a ji nû va dihat weşandinê weke organa Komîta Navendî ya Partiya Komûnîstên Ermenîstanê û hukumeta wê. Ji eynî salê da ya 1955a Radiyoya Ermenîstanê da li Yêrîvanê dest bi weşanên bi zimanê Kurdî bibûn bi zemanê nivsehetê. Yekîtiya Nivîskarên Ermenîstanê da sêksiyon, tayê nivîskarên Kurda hatibû organîzekirinê, sîstema Akadîmiya Ermenîstanê ya zaniyariyê da zaniyariyên Kurd bi Kurdzaniyê va mijûl dibûn, pertûkên zanyar û nivîskarên Kurd û her wa yên zimanê Kurdî yên fêran ji bona şagirtên dibistanên gundên Kurdan dihatin weşandinê, zanîngeh, înstîtûtên Ermenîstanê da bi dehan xort û keçên Kurd fêr dibûn. Em dikarin wa jî bêjin, li wê komarê Artêşeke ronakbîrên Kurd gorî jimara Kurdên Ermenîstanê ya giran hev girtibû, çend Kurd weke karmendên hukumatê postên angor bilind û berpirsiyar da hatibûn kifşkirinê û tiştên dinê. Hetanî hingê jî Nemir pirî-hindikî ser rewşa Kurdên Ermenîstanê hayîdar bibû, ber vê yekê jî ev pêşniyara rêvebirîya Sovyêtiyê, ku ew here nava Kurdên Ermenîstanê bi dilê wî bû, ewî bi şabûn pejirand. Rêvebirîya Sovyêtiyê tevî vê yekê biriyar danî, ku serlêdana M. Barzanî nava Kurdên Ermenîstanê bi asteke bilind, weke ya serkirdayê gelê Kurd, lê bi awakî nîvlêgal, nîveşkere bê bi

cîanînê. Eva yeka dihate wê menê, ku derheqa vê serlêdanê da nûçeke here biçûk jî mediya, pirêsa Sovyêtiyê da gotî neyê weşandinê: çî bi radiyoyê û têlevîzyonê, çî bi rojnaman.

Serlêdana Nemir di sala 1956 da li Ermenîstanê hate bi cîanînê. Li wira bilî karmendên hukumeta li Moskovayê û Yêrîvanê yên biyanî du karmendên hukumeta Ermenîstanê yên eslî xwe da Kurd jî rêvebirîya Nemir dikirin dema gera wî ya li wê komarê-Nadoyê Xudo Maxmûdov û Semende Elî Siyabendov, ku herdû jî cîgirên wezîrên Ermenîstanê bûn. Rasthatinek, weke me li jorê jî kifş kir, tevî gire girên ronakbîrên Kurd di rêdaksiyona rojnama Kurdî ya Riya Teze da bi Nemir ra hate çêkirinê. Lê ya here giring, pêwîst çûyîna Nemir bû nava Kurdên du gundên Ermenîstanê yên Kurda: gundê Cercerîsê (niha Dêrik) li navça Axbaranê û gundê Hekko li navça Telînê. Li wan gundan Nemir bi kêfxweşî li gundiyan basît ra axivî, çû malên çend gundiyan, ku nasiya xwe bide wan, qewil û şertên jiyana wan. Li vira jî hukumeta Sovyêtiyê weke xwe cara vîtrîn çê kiribû: malên here halxweş pêş da kifş kiribûn bona serlêdana Nemir û bi ser da jî mêbbêliya, dem û dezgên navmalê yên baş di wan malan da bi cî kiribûn. Lê Nemir ev yek tecrûbe kir û awayê çûyîna xwe li malên gundiyan guhêrî, rasttir, xwe xwa kifş dikir kanê here kîjan malê. Gava xwestin li Cercerîsê wî bibin maleke halxweş û ya merievkî xwendî û karmendê dîwana nawçê ya berê-Efoyê Emîrzade, ku ji derva jî avayê mala wî yê baş ji yê gelek malan cuda dibû, Nemir got: "Na, ez dixwazim herim a mala hana". Û ji dûr

va xanîkî kevin destnîşan kir. Belê, tecrûbe kir, ku dixwazin wî bixapînin. Piştî gera nava gundê Cercerîsê serokê wî gundî Lêvon Girîgorîyanê eslê xwe da ermenî di mala xwe da pêşwaziya Nemir û hogirên bi wî ra kir.

Bilî Cercerîsê, weke me got, Nemir çû gundekî Kurda yê dinê jî yê Hekko li nawa Tefînê. Li vira jî serokê vî gundî Kotê Şîrin Sedoyanê eslê xwe da Kurdê êzdî pêşwaziya wî kir.

Tehsîra vê serlêdana Nemir ser çanda Kurdî li Ermenîstanê û her wa li Yekîtiya Sovyêt ya mezin bû.

Barzaniyê Nemir bû sebebê vekirina du navendên Kurdzaniyê li Yêrîvanê û Lênîngîradê (niha Pêtêrsbûrg), ber ku rêvebirîya Sovyêtiyê biriyar danî bi pirsra Kurdî û çareserkirina wê va ji nêzîk va, weke pîrseke ji boyî xwe pêwîst mijûl, xerîk û gîro be, lê bo wê yekê jî pêwîst bû bingeha naskirina gelê Kurd û çanda wî û bi taybetî dîroka Kurdistanê çê bikin.

Sala 1959a li van herdû bajaran, nava sîstema Akadêmiya Zaniyariyê da beşên Kurdzaniyê hatin vekirinê. Lê netîceke vê serlêdana Nemir ya here mezin ew bû, ku gorî pêşniyara wî polîtîbûroya Komîta Navendî ya Partiya Komûnîstên Sovyêtiyê biriyar danî zemanê weşanên bi zimanê Kurdî bi radyoya Yêrîvanê ji niv sehetê zêdekin bigihînin sehet nîveke û wan weşana ser pêla navîn bi cî bînin, ku Kurdên dervayî Yekîtiya Sovyêt, bi giranî yên li Kurdistanê û yên diyaspora Kurdî jî bikaribin dengê Kurdî ji Yêrîvanê bibhên. Tehsîra van weşanên radiyoyê ser bîr û bawerên Kurda li Kurdistanê ya pozîtîv û pîr mezin bû, radiyoya Yêrîvanê

hişyarbûnek ya millî nava Kurdan da çêkir.

Lê ez dixwazim nemaze ser tehsîra vê serlêdana Nemir ya ser bîr û bawerên Kurdên Yekîtiya Sovyêtiyê bi giştî û yên Ermenîstanê bi taybetî rawestim. Gava hema hema hemû bineciyên gundê Cercerîsê, him mêrî, him jinî û him jî nemaze zar û zêç dora Nemir li navenda wî gundî civiyan, ewî berê xwe da serokê gund Lêvon Girîgorîyanê eslê xwe da ermenî û temiya ewên dora xwe ku bi hizkirin, bi heyîr û motac li serkirdayê xwe yê nû peydabûyî meze dikirin, wa da wî serokî: "Lêvon, ez çavên te radimûsim-tu jî çavên merivên ji miletê min ramûse". Belê, temiya xûşk û birên xwe yên xerîbiyê da li serokê gund yê ermenî kir. Weke dibêjin, serî-binî çend peyiv, hevokek û fikireke çiqas kûr, xemkêşîke çiqas mezin hindava evên dora xwe yên ji xûn û qinêt, ji miletê xwe da. Cara yekemîn Kurdên vî gundî dîtî, ku şexsekî bi navê xweş yê Barzanî wek serkirdayê Kurdan hatiye nava wan, dilê wî bi wan dişewite, xwedî li wan derdikeve, wana dihesibîne beşekî ji gelê Kurd, ku bi giranî li Kurdistanê dimîne. Û eger hetanî hingê Kurdistan ji bona bineciyên wî gundî navekî abistirakt, xiyalî bû, lê niha li ber çavên wan weke réalîtêyek û, ya here mûhîm, wek welatê wan yê eslî pîr nêzîk hate raxistinê, dîtî.

Beriya hatina Nemir hemû Kurdên Yekîtiya Sovyêt welatê xwe yê eslî ew Yekîtiya Sovyêt didîtî ber ku zû va tewiqê xwe, girêdanên xwe ji Kurdistanê birî bû, ku bi rastî nêzîk bû, lê ji ber danîna sûra hesinî, sînorê dirîkirî navbera wan û welatê wan da

hêviya xwe tam û tamam ji şûn da çûyîna bi wir birî bûn, nemaze Kurdên êzdî, ku ji ber zor û zulma–dagîrkerên Tirkiya Osmanî-welatê xwe terk dabûn, ji wir banz dabûn. Û eger yekî ji wan Kurdên Yekîtiya Sovyêt ya herî kêr Kurdistan weke welatê bav û kalên xwe bihesibanda, bidîta, bi nav bikra-wê ew nava xiyaneta hindava welatê Sovyêtiyê da, wek ajanê welatekî derva bidîtana û wê ew bi giranî bi sûc bikrana. Netîca serlêdana Nemir ya here giring û mûhîm ew bû, ku piştî cîhatina wê serlêdanê Kurdên Sovyêtiyê dikaribûn cesaret bikrana û bilî Yekîtiya Sovyêt Kurdistan jî bi nav bikrana welatê xwe, qet nebe yê bav û kalên xwe.

Netîca vê serlêdanê ya duyemîn-guhêrandina nava moral, pisîkolojiya Kurdên Sovyêtiyê da bû. Çiqasî jî desthilatdariya Sovyêtiyê gorî polîtîka Lênîniyê ya miletiyê gel û êtnosên welêt yên kêmjimar, yên hindikayî yên weke Kurdan jî, ku her bi tenê bi sebebê vê kêmjimariya wan komarên wan yên miletiyê di nava goveka Yekîtiya Sovyêt da nehatin çêkirinê, delalî kiribûn û îmkanên pêşvebirina çanda wan yên mezin amade kiribûn, xen jî, bilî her bi tenê, çend salên desthilatdariya Stalîn yên ji sala 1937 a ta mirina wî ya sala 1953a, çiqasî jî wê desthilatdariyê rê li ber bîr û bawerên nijadperestiyê, şovîniyê û bi cîhatina wan girtibû, lê Kurdên Sovyêtiyê di hemû komaran da, di nava miletên wan komara yên rêvebir da xwe şikestî, biçûk û xerîb didîtin. Çiqasî jî kêr û ne pir êşkere ji ber tirs û xofa hindava hukumat, dewleta Sovyêtiyê da, lê heqaret li wan dihat kirinê, ew weke qereçiyên bê cî û bê welat, weke

merivên koçer û paşdamayî didîtin û qerf û tinazên xwe bi wan, bi cil û bergên wan yê miletiyê dikirin. Piştî vê serlêdanê guhêrandineke moralî ya bingehîn ket nava bîr û bawerên Kurdên Sovyêtiyê. Ewana tecrûbe kirin, ku qet jî bêxweyî-bêxudan û bê welat nînin, ku Yekîtiya Sovyêt yekî weke Barzanî wek serokê gelê Kurd li Kurdistanê û bi wê ra tevayî yê wan jî dibîne û rêz û hurmeteke mezin hindava wî da dîhar dike. Peydabûna fikir, hesteke wa Kurdên Sovyêtiyê piştrast kirin, nava wan da serbilindî û rûmetgirtina hindava xwe bi xwe da çêkir. Belê, Kurdên Sovyêtiyê dîtin, ku ew qet jî bêxweyî û bê welat nînin, wek gelên cînarên wan ew hetanî hingê didîtin.

Tiştêkî dinê jî. Ewana pê hisiyên, ku Barzanî têkoşînê bicî tîne ji bona rizgarkirina wî welatê wan jî-Kurdistanê û eger ew di nava wî karê xwe yê pîroz da bi serkeve ew dikarin vegerin welatê bav û kalên xwe, ku hizreta wî di dilê bav û kalên wan da çû nava ax û bezên sar, ber ku ewana hemîşk ji nawçên Kurdî yên bindest, jêrdestên Tirkiya Osmanî hatibûn ser axa Împêratoriya Rûsiyayê ya berê û bi taybetî li herêmeke wê Împêratoriya Ermenîstanê bi cî bibûn ji bona rizgarbûna ji zor û zulma dewleta Osmaniyan.

Raste, dema serlêdana Nemir li Ermenîstanê, sed mixabin, min ew rû bi rû nedît, lê derheqa hatina wî nemaze li gundê Cercerîsê ez ji bineciyên wî gundî û bi taybetî jî xûşka xwe-Sûsikê pê hesiyam, ku wî gundî da mêr kiribû û piştî hatin û çûyîna Nemir ya li wir navê lawekî xwe danî Barzanî. We bidîta, kanê bineciyên wî

gundî ji hizkirin, rêzgirtin û serbilindîke çî awayî hatina wî li gundê xwe bîr danîn û her wa gotina wî ji bona Lêvon Girîgoriyan dubare û sêbare dikirin:eynî weke zarokekê, yê ku rewşa wî ya here giran da merivekî bi temenê mezin û bi hêz û xurt li wî xwedî derdikeve, bi ser da jî lê diheyîre, ji dilê wî, gorî daxwaz û armancên wî diaxive, wî hildigire, bilind dike û pesna wî dide.Ew zarokê bi çî awayî li ber xelkê vê yekê bîne ser zarê xwe.Eynî bi wî awayî çûk û mezinên Cerecerîsê besa Nemir dikirin û ew gotina wî bîr danîn.

Belê, wana ji xelkên dinê ra, yên ne bineciyên gundê xwe bi kêfxweşî û serbilindî serê gilî-gotinên xwe derheqa hatina Nemir li gundê xwe wa vedikirin:

"Hûn zanin, Barzanî ji Lêvonê serokê gundê me ra çî got?".Û piştî vê pirolaja bi awayê pirsiyarkirinê gotina Nemir danîn ser zarê xwe.

Min dixwest bi vê tangê ser nêrîn, hest û hiş, ser helwesteke bineciyên gundê Gecercîsê bi sivikayî rawestiyama ya ku di nava mejû û ruhiyeta wan da ji ber vê gotina Nemir Lêvon Girîgoriyan ra çê bû.

Ewana qet ji bona wê yekê şa nebûn, rasttir, qet jî hewcê wê yekê nîbûn, ku piştî vê gotina Nemir Lêvonê vir hada bi çavên rehmtir, qenctir weke serokê gund li wan cotkar û rênçberan mezeke.Raste, Lêvon eslê xwe da ermenî bû, ji milletê Ermenîstanê yê revebir û desthilatdar û yê pirjimar bû, lê hetanî warekî ew ji bona wan ne xerîb, ne biyanî bû, bi ser da jî weke Kurdekî bû.Bav û kalên Lêvon û yên neh-deh malbatên ermenî, ku bibûn bineciyên Gerçîsê, li kîderê bi giranî

Kurdên êzdî diman, zemanê şerê cîhanî yê yekemîn da ji herêma Mûşê, ji nava Kurdên wir cîhil bibûn hatibûn vî gundê Kurdan û ber vê yekê jî Kurdaxêviya xwe li vir jî berdewam kirin, zûtir ketin kirasê bineciyên vî gundî û Lêvon jî bi wan ra.Raste, ev gund yê Eemenîstanê bû, lê ber ku, weke me got, piranî, qalinaya, rûniştevanên wî Kurdên êzdî bûn, loma jî hetanî warekî Lêvon hewce, motac û minetkarê wan bû weke serokê wî gundî, lê ne ku ew hewce û minetkarê wî bûn. A Loma jî şabûn û serbilindiya Kurdên vî gundî bi giranî ji ber wê yekê çê bû, ku yekî weke Nemir-serkirdayê Kurdan yê bi nav û deng, ku li Moskovayê û Yêrîvanê rêz û hurmetê ji wî ra eyan dikin, xwedî li wana derdikeve û bi ser da jî temiya wan dide serokê gundê wan:wek bavekî, ku temiya lawên xwe bide xelkê xerîb, ku wan lawan nava wan da bicî dike, dispêre wan.

Di nava çend sehetên mayîna Nemir da li gundên Cercîsê û Hekko di nava bineciyên wan gundan da hizkirin, sîmpatiya, rêz û hurmeteke heqas mezin hindava wî da çê bû, ku piştî çûyîna wî gelek ji Kurdên Ermenîstanê û bi giranî Kurdên van herdû gundan û gundên dinê jî yên ser ola êzdîtiyê navê Barzanî li lawên xwe kirin yên tezebûyî.Bi vî awayî, her gundekî Kurdan da çend Barzanî peyîda bûn, lê ji ber rêz û hurmeta hindava Nemir da ew her bi tenê bi nav dikirin Bazo yanê-Barzaniyê biçûk.Gava ev Barzaniyên biçûk mezin bûn jî dîsa ji ber wî sebebî ew weke Bazo bi nav dikirin.Eva bûyereke nebînayî bû.Eva şedetiya wê yekê bû, ku Kurdên Sovyêtiyê Nemir ne ku bi

tenê weke serkirda, lê weke bavê xwe jî didîtin. Û ya here mûhîm: Kurdên êzdî ji bîr kirin, ku ola wan û ya Barzaniyê Nemir ji hev cudane. Em wê yekê jî bîr nekin, ku ewên navê Barzanî li lawên xwe dikirin ew bi piraniya xwe va ne ku ronakbîr bûn, lê cotkar û rênçberên êzdî yên basît bûn. Di vî warî da ne ku mejû, lê xûn axivî, hestên netewî bi ser ketin û wana dan îzbatkirinê, ku gelê me badîhewa negotiye: "Şûrê xîretê hertim serfêza şûrê dîn, olê dane". A bi vî awayî, weke me li jorê kifşkir, her çiqasî jî rêvebirîya Sovyêtiyê hewil da xwe, ku ev serlêdana Nemir deng nede û belkî jî di nava xelkên welêt yên biyanî da û nemaze yên dervayî Sovyêta Berê deng neda, lê di nava Kurdên Ermenîstanê û yên komarên Yekîtiya Sovyêt yên dinê da çiqasî bêjî ne ku bi tenê deng da, lê tehsîreke mezin, weke me dît, ser rewîşa wan û bîr û bawerên wan çê kir.

Li vê tangê min dixwest bal bikşanda ser tiştêkî pir mûhîm, giring. Nemir li Ermnîstanê çû serlêdana bineciyên du gundan û herdû jî yên Kurdên êzdî bûn. Vê helwesta Nemir îro lawê wî yê hêja Mesûd Barzanî berdewam dike û her wa tekarar, dubare dike, ku Kurdên resen êzdîne. Min dixwest ev yek weke ronakbîrêkî Kurdê êzdî bixista bîra xûşk û birên xwe-êzdiyên Herêma Kurdistanê û yên heta vê gavê dervayî sînore wê yê Şengalê, nemaze ji ber sebebê çêbûna bûyereke ne qenc û baş navbera çend Kurdên êzdî û yên musulman da û ev gotinên gelê me yê aqilbend jî bixista bîra beşdarên wê bûyerê: "Berê du bistanan jî hev dikeve"; "Meriv ji boyî xatirê çavekî hezar çavî dihebîne". Min dixwest, ku em Kurdên êzdî hêjayî wî nirxî bûna

yê ku Barzaniyê Nemir û dûhatiyên wî dane ser me Kurdên êzdî. Em gotî ji wê bilindayê ji bona çend kesên nezan û qefeseqet jor da neyên xwarê.

A bi vî awayî, Barzaniyê Nemir ne ku bi tenê gihîşt wî meremî yê ku ewî beriya hatina li Sovyêtê dabû ber xwe, lê bi ser da jî pir karên din yê hêja, pêwîst û qenc bi cî anîn ji bona xûşk û birayên xwe yên li wî welatî. Kurdên Sovyêtiyê û nemaze yên ku Nemir rû bi rû dîtin û guhdariya wî kirin, di çavên wî yên teyîrî da ne ku bi tenê Kurdistanê welatê xwe dîtin, lê her wa dûyeroja wê ya geş û ronik jî, ber ku ew bi bawerîke mezin ser wê duyerojê dipeyîvî û baweriya hindava wê duyerojê da nava wan da jî çêkir. Û îro, gava ew dûyeroja geş û ronik hatiye Herêma Kurdistanê, beriya hemûşkî ew rewîş bi saya keda Barzaniyê Nemir û xûna pêşmergeyên qehreman-şehîdnên Kurdistanê çê bûye.

Barzaniyê Nemir li Sovyêta Berê, weke me dît, nava qewil û şertên pir giran da ev merem û mexseda, ku beriya hatina li wir dabû ber xwe, bi cî anî. Her bi tenê serkirdayê xudanê zanîn-tecrûbên polîtîkî yên kûr û dewlemend, sebir û sikana mezin, xurtbûn û cesaretê nebînayî, îrada bi hêz û, ya here giring, welatparêz, miletparêziya bê sînor dikaribû ev hemû kar û bar pêk banîna. Kî ji xwe ra çi dibêje-bera bêje, lê serkirdayê weke Nemir, ku jiyana xwe bi zemanekî dirêj bê hêvişandin û bê bermayîn bide rihîna rizgarkirina gel û welatê xwe belkû sedsalekê carekê tînanê.

* * *

Min sernavê lêkolîn-pertûka xwe ya ser kar û barên Barzaniyê Nemir li Sovyêta Berê wa daniye: "Dosiya Ser Barzanî sandoqa Stalîn ya polayî da". Bilî dîharkirina faktoreke rêal ev sernav yê sembolîke jî, ber ku Nemir bi xwe jî, eger em dikarin bi vî awayî bêjin, çend sala xistibûn sandoqeke polayî û derê wê girtibûn, dadabûn, lê di nava vê sandoqê da jî ewî kar û barê xizmetkirina hindava gelê xwe da berdewam kir. Bi cîanîna vê lêkolînê min wezîfeke pir giran, bi berpirsiya

mezin, lê bi pê ra jî bi rûmet hilgirtiyê ser şanê xwe. Lê awa çi hêviya derketina ji bin wî barê giran bal min çê dike.

Ez bi cîanîna vê lêkolîna xwe ya ser Barzaniyê Nemir ne ku bi tenê weke bicîanîna berpirsiyariya xwe hindava wî da wek lawekî Kurd, wek ronakbîrekî Kurd bi giştî û dîrokzanekî dîroka welat û gelê xwe bi taybetî dibînim, lê her wa weke merem-mexsedê jiyana xwe jî.